

# ROJA NÛ

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên îngilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Bîrc; Weqîf Tabet, Telefona Dîwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

## CENG & SIYASET DEWRAN

### Rewîşa Italyayê

Rojnamayên talyanî zmanê xwe ji nû ve diguherînin û dirêjî Hevalbenda dikin. Heke Badoglyo daye eqlê xwe, û dixwaze welatê xwe ji derd û perîşaniyên şerî xelas bike û ev roj berî rojekê, heye ko na xwaze hevalbenda tiştê ko di dile wî de ye bizanin, û xwe dinexpişîne û dike pê qesda xwe veşêre. Ji aliyê din, eger talyana lez û bez xwe ne avêtin hextê Hevalbenda, û her çend ji bajarên talyanî ji nû ve tene bombardiman kirin, wan pê dane erdê, û bi dilekî xurt peyivîne û şerê Sicilyayê jî zû bi zû ne qediya, hevî heye ko Hevalbenda di şertên çekdandinê de comerdîr an nermîr bibin! Dibe ko siyaseta talyanî hisabê wan tiştê ji dike. Lêbelê xelkê Italyayê jî vî şerê giran û behêvî, ji êrişên refên bombeavêja bêhal ketine, û bê diliya Mareşalê xwe dikin û xelk di zehf bajarên de li Hukûmetê rabûne û jê xwestine ko ev şer bigêde. Di Romayê de, hawrên eskerî xweş dizanin ko piştî zêft kirina Sicilyayê bihmamî, Ordîyên Hevalbenda pê li Erdê Italya Nîroyî bikin û. êdî, herpirsiyariya talyanî hêj mezintir bibe.

### Wetenperwerên Frensîz

Xortên frensîz ên welatparêzê di dora Gola Jenevê de, dirêjî qerargêha talyana kirine, zabîte qerargêhê bi bivîrekê kuştine, şeqderba wî standine, pê sê eskerên talyanî ên din saft kirine, bi vî awayî deriyên depoçebilxanê vekirine, silêhên tê de birine û vegeryane çiyane. Her çend ji Ordîyên elemanî û talyanî erdê Frensê vegirtine, wetenperwerên frensîz pê çavîrsiyandî ne bûne, û telegrafên ko hero tî, şanî cihanê dikin ko frensîz bi bombe, bivîr, qumbere, şeqderb û bi her texlîl silêhan dirêjî dijminên Welatê xwe dikin, wan dikujin û pê di Frensê de, agirê eşqa welêt, pêftî û rivîniya azahî û serbestiyê na temire; û dijmin nikare di axa Frensê de, rahet rakeve. Ji aliyê din, di Erdê Efrîqa Bakurî de, Ordîyên Frensîzî hazîriya xwe kirine, ji bona êrişên ko ber bi destpêkirinê ne.

### Eskerên Xort û Ciwan

Gava mirov di kûçê û kolanên Bêrûtê de, li rayên xortên eskerên Hevalbenda ne dinêre, dil hêj bêtir qanî û qanî dibe ko ew xortên pak û paqîj, kubar û bi terbiye, rabûn û rûniştina wan çeleng û giran, ji bona tiştêkî adî û adeftî, ji bona tiştêkî ne heja ji welatê xwe ranedibûn, dev ji mal û milkê xwe ber ne didan, dest ji rahetî û jîna xwe a spehî ne di-kişandin û ne dihatin heta van dera. Ev xortên he dixwazin nîrê hêşîriyê ji dinyayê rakin, mîletên

# GOTARA GENERAL LEYER FRENSIZA XWE PÊK ANIYE

Ev e Gotinên General Leyer Serekê Şerdariya Frensîzî ya amdaşîrtî

**CEZAYIR—R:** Serekê şerdariya frensîzî ya amdaşîrtî General Leyer gotiye ko Ordîyên Frensîzî hazîriya xwe kirine û xwe pêk anîne; ji bona xelasiya erdê Frensê, ji bona tevdanên eskerî yên ko di wextêkî nîzing de wê destpê bikin.

**GENERAL DE GOL & GENERAL JIRO**

**CEZAYIR—** Bi qerara Komîta Frensîzî a Xelasiya Welêt, General Jîro bûye Serdarê hemî qiwetên frensîzî. Bi vî hêncetê General Jîro reşbeleka jêrîn şiyandîye General De Gol. «Êdî bitenê Ordîyeke frensîzî heye; û ez spasana dikim ko we fermandariya min nas kirî-

ye: Ji eskerên ko bi we re girêdayî ne bibêjin: tiştên ko wan pêk anîye ez dizanim û bi tiştên ko ewê bikin, qîma xwe fînim. Emê bibînin ko em hemî eskerên Frensê ne û her jî eskerên Frensê bûn.

Ez dixwazim ko ew mîna berî jî wê hez bikin û baweriya xwe bi min bînin, ji bona armanca bilind û mezin ya ko di pêşiyê de ye: Serbestkirina Frensê. Sibê di bajarê Metzê de, yê ko wê bête xelas kirin emê hev û du bibînin»

Ji dil yê we: Henrî Jîro. Bersîva General De Gol: Generalê min! «Pîrsên we ketine dilê min, û

leşkerên frensa şerevanî pê gelek şa bibin; piştî felaketên şerê Frensê, ew bûbûn piştmerên Ordîya me, ew fro pêşmerên Ordîya frensê ne. Ewê di nav Ordîya Frensîzî de bi germî û çav sorî karê xwe pêk bînin. Komîta Frensîzî a Serbestkirina Welêt hon kiriyê serfermandarê hemî qiwetên frensîzî; eskerên frensê bikevin pey we, bi eşq û mêraniya ko hon, eskerê mezin û sêrmîyanê heja şayeste ne. Sibê honê wê Ordîyê bi arîkariya Xwedê bêxîn meydana şerî, şerê ko pê Parîs xelas bibe.» Bi dostî yê we: General De Gol.

## OREL - KATANE - BIELGOROD

Di Nav 24 Saetan De Ev Her Sê Bajar Hatine Standin

**CEZAYIR—R:** Danezanekê xas elam dide: Ordîya britanî heşt KATANE stahdiye.

**MOSKÛ — R:** Serfermandariya sovyetî dide zanîn: Ordîya Sor OREL û BIELGOROD vegirtine.

**CEZAYIR—** General Katrû duhî sêrê sibehê ji Cezayîrê rabûye û berê xwe daye Oranê, General Katrû bi awakî resmî diçe xatîrxwaziya vî bajarî.

**LONDRE—** Li gora nûçeyên ko hêj ne hatine xurtandin sefirê Sovyetîstanê li Kenadayê M. Feodor Gusef wê here Londrê û bikeve şûna M. Maiskî.

**NÛ—DELHÎ—** Refên britanî dirêjî axa Bîrmanyayê kirine û kozîk û penahên japonayê nevala Irawadiyê dane ber bomban.

## ORDIYA SOR

GIHAYE DERIYEN ŞARISTANA ORELE

**MOSKÛ—** Serfermandariya Sovyetî dide zanîn: Leşkerên sovyetî ber bi Orelê ve jî nû ve 6 û heta 10 kilomêtir pêş ve ketine. Qiwetên me 50 avahîgeh vegirtine. Stasyona Domnînoyê, 11 kilomêtir li rohelatê Orelê û stasyonên Stîj û Pilatovkayê 8 kilomêtir li alî nîro rohelatê wê ketine destê me. Ber bi Bielgorodê ve tevdana kewte û sedmêran dom dîke. Di axa Donetzê de û li nîro-roavayê Vorosîlovgradê xesarên giran gihaye dijmina û wan dest ji erîşan kişandine.

Di eniya Leningradê de û li bakur û li rohelatê Mgayê tevdana kewte û sedmêr û topçiyân. Duhî qiwetên me 141 tang û 180 balafirên elemanî xira kirine.

dinyayê bigehlnin azahî û serbestiyê, da ko rûyê mîletên ezabdiîf bikene. Wextek hebû, heq û dewlemendî malê mezinan bû, malê mîr û axan, her wextî di jiyîna mîletan de, dewletên mezin heqê yê bigûk dikuştin. Lê di piştê pêşveçûna Ewropayê gihabû dereca ko êdî ne dihat bîra mîletên mezin; destên xwe dirêjî heqên mîletên bigûk bikin. Wan dixwest mîletên dinyayê hemî bibin serbest.

Lê sala 1914 û 1939-an de eleman rabûn û pê li heqê mîletên bigûk kirin, û pê şerîne mezin çêbûne û çêdibin.

Serbestî û azahiya Polonya, Çekoslovakiya, Yugoslaviya, Libnan, Sûriye, Iraq, Yemen û Hîcazê berê

mêraniya bav, bira, xal û pîsma-mên wan eskera ne ko em di kûçê û kolanên Bêrûtê de dibînin.

### Em û Cihan

Kurdan jî bona azahî û serbestiya xwe, gelek xwîn rijandine û fro ko mîletên dinyayê ên bigûk û mezin, ji bona serbestiya dinyayê şer dikin, fidakariyîne mezin dikin û ji bona mezinahiya welatê xwe û rahetî û selametiya cihanê bi qiwetên zîlm û zorkeriyê di şerî de ne, xebata hindîk li kurdan mîna betalman tê. Lê kurd çî bikin, Nimnendeyên Hevalbenda xweş dizanin, kurda jî bona her fîrîkariyê hazîr bûna xwe jî wan li elam dane.

## XESARÊN ELEMANA

**BI HEZARAN TANG & BALAFIR XIRA BUNE**

**MOSKÛ—R:** Ji pêncê îfrmehê û heta 30-î qiwetên sovyetî di eniya Orel—Kurskê de 4.305 tang û 2833 balafirên elemanî xira kirine.

**WESINGTON—** Wezaretê Emerîkanî a qiwetên hewayî elam dide: Her meh febrîqeyên emerîkanî 4.500 balafir teslîmî me dikin. Karxaneyên emerîkanî li ser hev her meh 7.000 balafira çêdikin.

### Gotara Nimnendeyekî

**LONDRE—** Ji lebaten cîvalmîletê Emerîkanî 5 nimnendê, li dinyayê digerin û temaşa qadên şerê cihanê dikin. Yekî jî wan Mr. Rişar Rusel gotiye: Qesda me ev e ko her mîlet divê bixwe hikûmeta xwe bibijêre: keqê tu mîlett bi hênceta ko ew bi xwe ne mîletekî mezin e an erdê wê biçûk e; ne yê şêknanandin û betal kirin.

## HÊVIYA NÛ

*Raza me li her dergêhê meyxaneyê naşim  
Serbestî û bê heş,  
Mîna keşyê sondxwari parastegî xas im  
Wergirti cîlê reş,  
Min xas û pîlên xwe wekî İbrahim şikandin  
Ez bûm bi serê xwe,  
Min şêx û mela, sofî û derwêş qewilandin  
Ji pêş derê xwe...  
Min hevî zebûn bû ji mezin rispt û kalan  
Heyhat û hezar ax!  
Sist bûne rehên şer û pîling gur û şepalan  
Tev bûne malkambax!  
Kes nine ji dil bo gelê kurd bike zebatê  
Wek Rîstem û İhsan,  
Bi destê zorê veke rêya jin û felatê  
Dilgeş bike kurdan.  
Gava ko me dil dem holê bêkêr hat ji bo me  
Zendê xwe vemalan,  
Xebata welêt karekî dijwar û bi dom e  
Gazî ji hevalan.  
Me hevî nema ji kesî, bê xortên welatî  
Ew hîmê welêt in,  
En İtra neyar cerg û hinav jê sot û pallî  
Tev agir û pêt in  
Yekî me divê, me rê ew e, em dê bigin her  
Yezdan arîkar bû,  
Serdestî ji bo me ne pîr e em dê bibin, ger  
Cihan bi neya- bîl...  
OSMAN SEBRÎ*

# DEMA NIHA

## 125.000 HËSIR

CEZAYIR—R: Heta niha leşkerên Hevalbenda di Sicilyayê de 125.000 hêsr girtine;

CEZAYIR—R: Refên Hevalbenda bê elahi hêjagehên erdê Mesina ye û peravên di wê bombardiman dikin.

LONDRE—R: Radyo Berlinê dide zanîn: leşkerên sovyetî yên ko di axa Şuguyevê de li hev civiyane— Şuguyev dikeve nîro-rohelatê Xarkovê û jê 20 ml dîr e — êrîş çeper û penahên elemana dikin. Di eniya Şuguyevê de, şerîne zor û xwîndar çêdibin.

CEZAYIR—R: Qerargeha Hevalbenda a mezîn li Efrîqa Bakurî dide zanîn: Peşgeçûna Ordiya heştêmîn, der hemî qadan dom dike. Qiwetên elementî xwe bi şûnda dikişînin û rê û pîrên dora xwa xira dikin. Ordiya heftêmîn Troina zêft kiriye. Li ser rîya perawan dijîmin bi xurtî berberiya Ordiya Emerîkanî 7 dike.

WEŞINGTON—R: Di nav meha tîrmehê de karxaneyên emerîka 1 7.343 balafir çêkirine, ji meha hizêranê 400 heb bêtir.

STOKHOLM—R: Wezîrê elemanî ê dervekarîyê Von Ribentrop û ye talyanî Guariglia di Italya Bakurî de, li bajarekê hev û du dîtine.

MOSKÛ—R: Ordiya Sor ber bi Xarkov û Brianskê ve, pêş ve di-ve; leşkerên sovyetî jî nû ve 100 avahîgeh vegirtine.

CEZAYIR—R: Di bendera Napoliyê de agir bi wapora talyanî a mezîn Lombardî ketiye, ew dişewite.

## ITALYA GUB BIDE!

### Rojnameyên Ingilîzî Bi Tevayî Dibêjin

LONDRE—A.F.I. Rojnameyên ingilîzî li ser rewîşa Italyayê dinivîsin: «Deylî Meyil» dibêje: Badogîlyo an divê xwe bavêje bextê Hevalbenda, an ne here. Sebra Hevalbenda ne bê tixûb û şnor e. «Deylî Herald» dinivîse: Divê ala spî; ala teslîmê li ser serê erdê Italyayê pêl bide: daxwaza Hevalbenda û ya mîletê talyanî ev e. «Deylî Telegraf» dibêje: Di hemî îbadetgehên Italyayê de xelk ji bona silh û aştîyê dia dikin û keşe ayînine mezîn çêdikin. Çîre hikûmeta Romayê bi tîştîne tîrtaluke dileyize û dest ji vê leyistîne na kişîne. Me xwe pêk anîye; divê bizane. Rojnama Londrê a mezîn «Teymîs» şîretan li talyana dike: Heke ev fîrsend ji destê talyana çû, jê hikûmeta wan berpîrsiyar e... Koka şarîstana elemanî a mezîn Hamburg ji erdê hatiye rakirin: bombeyên Hevalbenda li wê tîşte ne hiştîne, Berlîn dîtirse... Talyan dev ji bajaran berdidin û xwe davêjin gund û darîstana... Hikûmeta Romayê dilerize, lê ne digire, û ne jî berdidin... «Nîyûz Kronîkîl» dibêje: Erdê Italyayê ji bona me qerargeheke gelek hêja ye û em nikarin vê erdê destê elemana de bihêlin. Fikra «Deylî Telegraf» ev e: Ji bona şkenandîna dijîminê me hejmar «1» eleman, divê di erdê talyana de em bibin xwedî war û qerargeh; û heke ji bona vî îştî divê emê talyana saffî bikin, bila ew bizainna, me hazîriya xwe kiriye.

## SERFIRAZIYA ORDIYA SOR

### Ordiya Sor Ber Bi Briansk û Xarkovê Ve dimeşe

MOSKÛ—T.F.I. Şerê Orel û Bielgorodê bi serfiraziya Ordiya Sor qediyaye.. Ji 5-ê tîrmehê û heta 6-ê tebaxê, angû di nav mehekê de leşkerên sovyetî 120.000 serbend û eskerên elemanî kuştîne; û 4.605 tang, 1.625 top, 2.492 balafir û 11.000 kamyonên elemanî jî hev de xistin; û 524 tang, 873 top — pîraniya wan motorkîrî — 2.521 mitralyoz, 355 depoxaneyên zad û zexîran standîne; 11.418 hêsr girtine, û ji destê dijîmina 840 bajar û avahîgeh xelas kirine.

MELBURN—Danezaneke xas elam dide: Leşkerên me Munda vegirtiye, dijîmin hatiye bela wela kirin. Şerên bi tevger û rêzik sekinîne. Qiwetên japonî ên belavbûyî tene qelandin. Heta niha 1.671 kuştîyên japonî li erdê mane.

## EBDILMECÎDÊ KURÊ HECÎ HERSAN

### Xortên 25 û Zaroyên 7 Salt Dixwînin

Seydayê delal Mîrza Ebdilhadî Mihemed, je me re dinivîse: Mîrza Ebdilmeçîdê Kurê Hecî Hersan xortekî 25 salî ye, di nav 7 rojan de, hînfî Elfabeya Kurdî, û xwendin û nivsandîne bûye, û kitêba Xwendîna Kurdî jî qedandiye, û niho Roja-Nû, Ronahî û Hawarê dixwîne. M. Eb. dîlmeçîd jî we re deh îlreyên sîrfî dişîne, kiriyariya Roja-Nû. Brazîyê Mîrza Ebdilmeçîd, Şêxê jî, ye ko zarokêkî heft salî ye, di nav wan 10 rojan de dersên xwe ên kurdî timam bike.

Roja-Nû: Xwedê te li mîletê me bihêle Mîrza Ebdilmeçîd. Ber xurdar be, sax be, te gavek avêtîye, û bi te re mîletê me jî gavek avêtîye, ber bi pêşîyê, ber bi ronahîyê, ber bi serbestîyê ve. Kurd mêr û mîrxas in, û şertê mezinahiya mîletan ê bîngêhn ev e, lê bê zanîn û hîner, mîranî ev hesin e ko di bin erdê de ye, ne hatiye xebitandin, û ne ketiye şikîle tomobil û balafira, rêhesin û wapora, şur û geşderban.

Pêxemberê me—rehmet û silava Xwedê lê bit—qedrê du peyan zehf digirtî ye ko hînfî dike, darsa xelkê dibêje, mîna Seydayê Ebdilhadî Mihemed, û mîna te ye ko hînfî dibe, dielîme, ji tarîttîyê derdikeve û rûyê xwe dide ronahî û pêşveketîne. Brazîyê Ebdilmeçîd, Şêxê biçûk, Kurê min ê delal, xweş bixebite, zmanê xwe ê sîrfî zû bielîme. Roj, Roja-Nû spêhî ye, ji ber ko çavîn hene lê dinêrin û pê kîfxweş dibînin; ji bona korên reben, mîrovên çavtarî qîmeta roj û ronahîyê çî ye ll... Kurdîno... hînbîbin... hînbîkin... rîya xelase di kitêban re derbas

dibe.


## MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYEN SER U ASITIYE

### DESTXETEN CELENG



Xelkê Britanya [Mezîn di her tîştî de zana, şehreza û hêja ne. Xebat can dide her tîştî, di nav destên Zanayan de hesin, dar, kevir, dibin candar.



Kevirtirraşekî ingilîzî, hosteyekî mezîn û çîredestîyên di wî. Heykeltirraşê Igilîzî Ê Hêja û Binav û Deng Mr. Burton.

## HAMBURG NE MAYE

### Xelkê Bajêr Ber Bi Gund û Darîstanan Ve Bazdidin

STOKHOLM—Xebatkerên demîmarkî yên ko ji Hamburgê hati- ne dibêjin: Ji Hamburgê piştî bom- bardimanên Hevalbenda tîşteke ne maye; Hamburg êdî ne bajarek e, xelkên vê şarîstane ber bi bakur û rohelatî ve bazdane û ev bê ko guh bidin Erarên hikûmetê. Kûçe û ko- lanên Hamburgê bûne mîna yên bajarên Frensê û Belçîkayê di sala 1940-î de. Ji 10.000 xebatkerên demîmarkî 5.000 vegeyirane erdê Demîmarkayê. Pîraniya wan bi pîja- meyên xwe ji Hamburgê derketine, û vegeyirane welatê xwe, her tîştê wan di bin xirbe û xerabezaran de, pelixîne, wînda bûne. Roj- nameyên elemanî dibêjin ko bombe- yên hevalbenda Hamburg kiriye cehenema kambaxî û xerabezaran. Perîşanî gihaye dereca ko gotin nikarin wesa wê bide. Trêñ xel- kên bê ban û serban, qesleyên brîndara ûmîn Berlînê: lê Berlîn bi xwe jî dawîya wê çî bişê nî zane?!

# LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wkfs Tabet  
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE

Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement  
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE  
DE LA GUERRE

5 Août 1943: encore une date qui aura sa place dans les futurs livres d'Histoire.

Sur le front oriental, une des charnières capitales de la ligne de défense Allemande, Orel, est réoccupée quinze jours seulement après le déclenchement de la contre-offensive russe. Orel avait été occupé par les troupes de la Wehrmacht au début d'octobre 1941. Fortifiée depuis lors comme peu de villes l'ont été, transformée en base de ravitaillement, elle comptait certainement dans les plans stratégiques du Führer comme devant servir de point de départ pour une offensive contre Moscou. Sa reprise par l'Armée Rouge est non seulement une grande victoire (qui sur le plan militaire n'a pas l'importance de l'écrasement de Stalingrad) mais aussi et surtout elle est la preuve définitive du renversement du rapport des forces en présence.

Stalingrad représente le point culminant de la défense russe, puisqu'en fait c'est grâce à la surhumaine résistance de la ville que les troupes soviétiques purent progressivement isoler tout le secteur et détruire ensuite les 350.000 hommes qui la tenaient.

La reprise d'Orel montre, elle, que l'Armée Rouge en est maintenant au stade de l'offensive; et sa puissance est telle que Bielgorod, deuxième bastion qui avait servi aux Allemands, avec Orel, de base d'attaque contre Kursk, il y a un mois, est enlevée peu après dans un style magnifique.

Mettant à profit la désorganisation des lignes ennemies, utilisant sans répit son aviation qui, d'après un communiqué, a dans le secteur d'Orel la maîtrise totale de l'air, l'Etat-Major Soviétique semble vouloir s'occuper maintenant de Kharkov.

Ce même 5 Août, venant infliger à la Wehrmacht un nouveau coup de massue, les troupes du Général Montgomery occupent Catane après et malgré une violente résistance. Elles ne sont plus qu'à une cinquantaine de kilomètres du dernier port d'embarquement de la Sicile. Cependant que les troupes sont sur le point de contrôler la dernière route qui contourne l'Etna, et que les Américains se rapprochent de Messine par la route côtière.

Il est probable que la chute de la Sicile accélérera la reddition de l'Italie et que le Maréchal Badoglio devra céder sous la pression populaire qui se fait de plus en plus nette en faveur d'un armistice immédiat.

La grande importance de ces événements politiques et militaires ne doit pas faire perdre de vue que dans le Pacifique, les Australiens et les Américains viennent d'occuper Munda, grande base aérienne de la Nouvelle Géorgie.

## RESUME DES NOUVELLES

FRANCE: Le Général de Gaulle prononce un discours à Casablanca.

MEDITERRANEE:— Les défenses allemandes au sud de l'Etna ont été enfoncées par les armées alliées.

RUSSIE:— Les forces soviétiques continuent à avancer en direction de Briansk et de Kharkov.

FRONT OCCIDENTAL:— La R.A.F. bombarde la gare de Rennes.

FRONT DU PACIFIQUE:— Les troupes chinoises avancent dans le Chekiang.

CASABLANCA — Prenant la parole, hier, à Casablanca, le Général de Gaulle a déclaré notamment:

«Une fois de plus, au cours de sa longue histoire, la preuve est faite de la cohésion de la France Eternelle.

«Notre Empire, si divisé par des pé-

ripétées dramatiques, est sorti de la guerre pour y rentrer par la suite, morceau par morceau.

«Si nous reconnaissons les cruelles conditions auxquelles notre pays est réduit, aujourd'hui, nous ne méconnaissons pas les fautes qui nous ont conduit au bord de l'abîme.

«Nous savons que la France Combattante a littéralement joué la dernière carte de la Patrie. Nous savons aussi qu'un immense effort nous attend pour arracher la France à l'envahisseur et la rendre à nouveau heureuse et libre.

La résistance française organisée sera engagée contre l'ennemi au moment le plus propice, l'armée de terre, la Marine et l'Aviation Française sont prêtes.

«Ce que nous voulons, c'est un effort commun et enthousiaste,

«Ce que nous voulons, c'est un renoncement aux abominables querelles d'autrefois: l'Union Nationale qui rassemble toutes les ardeurs de la France.

## UNE PETITE NATION: UN ETAT MODELE

Ce n'est que vers la fin du XVIII<sup>e</sup> siècle que les doctrines de la philosophie politique occidentale et que les principes de la Révolution Française se répandirent jusqu'à l'est et que la Tchécoslovaquie reprit conscience de son sentiment national. La pieille lutte pour la liberté reprit et des efforts furent tentés pour obtenir des droits nationaux dans l'armature de la Monarchie austro-hongroise des Habsbourgs. Une nouvelle lutte se déclara contre l'autocratie, c'est-à-dire la dictature centrale exercée à Vienne, la capitale de la Monarchie austro-hongroise. Les Tchécoslovaques, peuple d'idéal démocratique, étaient bien résolus à échapper une fois pour toutes à l'esclavage.

Ils obtinrent enfin cette liberté sous la conduite de T.G. Masaryk (lire: Masaryk) d'Edvard Benes (lire: Bénès) et de R. Stefanik, un trio de mousquetaires aussi valeureux que pouvait en soulever toute démocratie.

C'est le 28 octobre 1918, à Prague, qu'eut lieu le soulèvement révolutionnaire final des tchécoslovaques, et le

jour du 28 octobre est à jamais devenu la Fête Nationale des Tchécoslovaques.

## UNE NATION DE CULTURE

Rien dans l'histoire de la Tchécoslovaquie n'est plus remarquable que la survie à travers des siècles de luttes et de guerres, de sa langue et de sa littérature. Sa tradition littéraire remonte à un millier d'années. C'est en effet au X<sup>e</sup> siècle que commença la production littéraire tchèque. La fondation au XIV<sup>e</sup> siècle de l'Université de Prague coïncida avec une période particulièrement brillante de la littérature tchèque, à la fois par le volume et par la qualité.

Ce fut l'époque où Jan Hus (lire: Jan Huss) réalisa le tour de force de mettre le langage littéraire à la portée des gens ordinaires auxquels il s'adressait. Ceci donna naissance à son accentuation ingénieuse de l'alphabet tchèque et au système qui servit de modèle aux autres langues slaves. L'orthographe de Hus (lire: Huss) reste aujourd'hui la base de la langue littéraire tchèque.

Pendant deux siècles, la littérature tchèque traita surtout de sujets religieux et moraux. Elle acquit tout à coup une

nommée européenne grâce à Yan (lire: Yan) Amos Komensky (1592-1670), le penseur connu sous le nom de Comène. Pendant la Guerre de 30 ans, Comène fut le chef spirituel de son pays et sut réunir en sa personne la vraie morale religieuse et l'expression artistique de la Renaissance. Cependant, le monde se souvient mieux de Comène pour ses ouvrages sur l'éducation. Il comprit l'importance d'un système d'éducation comprenant le chant, la politique, l'histoire mondiale, la géographie, la lecture et les arts et métiers. On attribue à Comène la publication du premier livre destiné à l'enfance.

Les traditions de Hus (lire: Huss) et de Comène semblent s'être perdues après



la Guerre de 30 ans, sous la terreur et la tyrannie des Habsbourgs. Mais la langue ne périt pas. Grâce à d'inlassables efforts, les savants et les poètes tchécoslovaques retrouvèrent la vigueur florissante de leurs prédécesseurs et leur langage s'épanouit de nouveau comme une expression parfaite de la littérature.

Dans la première moitié du XIX<sup>e</sup> siècle, l'âme nationale jamais étouffée s'affirma avec un nouvel éclat. On ne peut pas citer le grand nombre des grands écrivains tchécoslovaques modernes, de la belle littérature ainsi que de la science. Disons seulement que leur œuvre a donné au monde cette impression d'une Tchécoslovaquie heureuse du type du vrai démocrate à qui on n'en fait pas accroître. Dans les ouvrages tchécoslovaques modernes le lecteur trouvera la littérature du vrai peuple, une littérature pleine de compréhension, chantant l'amour de la nature, une littérature empreinte d'un lyrisme bien particulier que la traduction ne parvient pas à étouffer. Plus que cela, la littérature ainsi que la philosophie de la démocratie et de l'humanisme restaient toujours le socle de toute la vie du peuple tchécoslovaque, et de ses activités politiques surtout.

(à suivre)

## LE COURANT

A pas lents  
J'ai suivi le courant  
Murmurant  
Au bord de cette rivière.  
Longue comme une souffrance  
Calme comme une prière  
De vierge;  
De loin me souriaient  
Les fenêtres d'une auberge.  
L'eau était claire,  
L'air tendre, douce la lumière.  
Cette eau basse et limpide  
Comme une jeune fille timide  
Caressant l'herbe fraîche...  
Et des fleurs rouges  
Comme des cerises et des pêches  
Formant des berceaux dans les haies  
Pleines de paix,  
Où dort le silence  
Où brillent chantent et se plaignent  
Les couleurs des iris  
Et les âmes des roseaux.  
Glissait joyeuse à travers les forêts  
Sur des cailloux gris et du sable doré.

Soudain  
Le courant pensif s'arrêta  
On aurait dit un athée  
Touché par la foi  
Pendant des jours et des mois.  
Le fond  
Devenait profond  
N'était plus limpide  
Et des insectes insipides  
La ravageaient  
Comme la charogne d'une bête.  
Au fond de l'eau une tête d'étoile  
Regardait cette triste fête.

Un geste qui ravit,  
Un sourire,  
Une larme un soupir, un rire  
Plus lourd que les chaînes  
Des navires  
Et le fer des forçats  
Arrêtent le courant de la vie.

## LE CIMETIERE

Cantique des cèdres,  
Cantique des tombeaux,  
Gouffre souterrain  
Rempli de flambeaux.  
A quoi bon s'en aller  
Mais pourquoi donc rester  
Sous la cendre dorée  
Du soleil attristé.  
En aimant les brunes,  
En admirant les blondes,  
Le rivage, c'est la mort,  
Nous ne sommes que des ondes.

DR. BEDIR KHAN

## LA PRESSE KURDE

Nous signalons, à nos lecteurs s'intéressant au mouvement culturel KURDE, les journaux et périodiques kurdes suivants:

**RIYA TAZÉ** organe des Kurdes de l'U.R.S.S. paraissant à Erivan.

**GALAWÉJ**, la plus grande revue littéraire kurde, paraît chaque mois à Bagdad, avec 80 à 100 pages de texte hebdomadaire politique et littéraire paraissant à Soule-manié.

**JITAN**, revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Damas. Textes kurdes et français.

**HAWAR**, Revue mensuelle illustrée, paraissant à Damas.

**RONAH**, Revue mensuelle illustrée, paraissant à Damas.

Prochainement, LE JOUR NOUVEAU paraîtra une fois par semaine, le Lundi.

# DÜRİK

DÜRİKEN LI BER TEMBÜRÊ

## LE NÜRÊ

Lê Nürê, lê, lê Nürê  
Ziravê, beqîşürê  
Sê bisk j' têla tembürê  
Dora te l' ser tenürê.

Bejna Nürê ew l' takî  
Ba lê d' xîné j' hawakî  
Bejna Nürê şîva ter e  
Ba lê d' xîné ji xeram û me re.

Ezê b' çepî Nürê bigrim  
Bibim j' nefsa canê xwe re  
Nav dewletên ecnebiyê  
Li ser bûye qal û şer e.

Lê Nürê, lê, lê Nürê  
Sê bisk j' têla tembürê  
Sing û berê te gewr in  
Mîna berfa li Xeybûrê.

Lê kim dîmsê Bizgûrê  
Ezê b' çepî te bigirim  
Bavêm suka Bedlîsê  
Lê Nürê; lê, lê Nürê.

De wayê, Nürê wayê  
L' te porsorê porbeleyê  
Destûra te lawikî  
L' ser cotê memka didayê.

Tama memkê Nürê xweş in  
Pirtikala li rihayê  
Wek şekirê l' dor Besrayê  
Dê wayê, Nürê wayê.

Lê Nürê te kir, te kir  
Sê biskê sor hine kir  
Te miradê dilê xwe kir. .

Nürê dî li banê banî  
Heke Xwedê li hev anf  
Ezê te mehr kim l' vî cantî.

Nürê dî bû l' gasinê  
Kiras-sor e wek xwîné  
Mihbeta dila difirinê.

Lê Nürê, te kir, te kir  
Te miradê dilê xwe kir  
Te sing û ber j' mir venekir  
T' a min bû Xwedê ne kir.

Nürê dî, banî, banê  
Tu b' kofi û bi' k' tanê  
Tu b' şar û b' kesrewanê

Tu b' xeftana şamî  
Mihbeta dila şêrin e  
Tu xêşin î, tu nezan î

Te derî bişkoşka min vekir  
Te l' memkê min temaşa kir  
Min dî fîncana de hûr dikir  
Mîna bû dîms û şekir.

Min b' ser devê mezîna dakir  
Nava min hênik ne kir  
Te tiştêk başir ne kir.

# WEYSO!

Weyso wey, wesla ye  
Xanyê bav' Weyso ça mezin e  
Hîna li desta, l' ser bazin e  
Tu par qîz bû, fsal jin e.

Xanyê bav' Weyso ça bîçûk e  
Hena l' desta l' ser nenûk e  
Tu par qîz bû, fsal bûk e

Weyso, Weyso, Wesla ye  
Teşîresê gilok bada ye  
Tama memkên te xweş in  
Wek xurmayê Bexda ye.  
Wek şekirê Besra ye  
Sozek bû, mi' b' t' er daye.

## M' Xewna Te Dî

Her lê lê, de lê lê lê  
Her ne dî, ne dî, ne dî  
Sevê çuyî m' xewna te dî  
Mi' destê xwe l' ser memkê te dî  
Mi' devê xwe l' ser rûkê te dî

Xwezla gewrê a min biwa  
Bîla biçme ji vî beledî  
Bîla ez ne mirim ebedî  
Kesek tîmêla te ne dî.  
Li ber te bûm kewka kedî.

Mi dî bû li berwarê  
Xwedê mêrê te ne hêlê  
Mêrê te pîs e lê lê lê  
Mîna mişkê d' bin kewarê.

Mîna çarûkê gemarê  
Mîna zembîla xesarê  
Xwedê mêrê te ne hêlê.  
Mîna qeraşê l' ber sêlê  
Ezê bi çepî te bigirim  
Bavêm welatê jêrê.

Mi dî bû l' ser qubê  
Te dî bû l' ser qubê  
Bejin ziravê, ser bî ribê  
Her lê lê, de lê lê lê...

Mi dî bû li ser avzêlê  
Te dî bû li ser avzêlê  
Li te esmerê, koffikêlê  
Ezê bi çepî te bigirim  
Bavêm welatê jêrê.  
Tama memkên te xweş in  
Wek şekirê bajare.

Mi dî bû li ser benderê  
Esmerê, xizem zerê  
Keça sa, qîza kerê  
Şêrinê milteberê  
Ezê rabim te b' revînim  
B' kotekê, b' darê xengerê  
D' ser qêhrê mêrê te re.

Binya mala bi qaş e  
Daw û derlingê te qîmaş e.  
Kuçikê mê rê te ne baş e  
Wek keraş e l' ber aşê.

# PÛJINÊN DINYAYÊ



Leşkerên Hevalbenda Di Kûçe û Kolanên Tûnisê de.



Di Pesifkê De Şerekî Behrî û Hewayî.



Frensîza Gava Dîtine Ko Eleman Destê Xwe dirêjî Cengkeştîyên Frensîzî Dikin, Bi Destê Xwe Ew Bin Av Kirine.

## Strana Kurdî

### Fermana Mala Brahim Paşa A Dawîn Sala 1919

-3-

Wezîro...

Mi ji tel—Henê Heta bi We-  
ranşarê, pozê serê Hey'et geriya li  
Mehfelê, civat geriya li Mehfelê.

Kensê bankir Mehmûdo lawo,  
pêşîya qumandara xwe da girê We-  
ranşarê û quweta mezin xwe da  
aşê Elo Dîna, til-Bênderê, xema me  
xwe, ev ferman wek fermana cara  
berê;

Wezîro Weşarşara şewitî bi  
kevîr e, û hevde mala şewitî bi hûr  
kevîr e, şahidê Evdurehman Beg  
bavê Haçim apê Radda gelek he-  
ne, ji til—Henê, heta bi Weşar-  
şarê, hucûmî topa mezin kire, ba-  
rûda topê li ser serê bavê Haçim bû  
komîr e.

Wezîro ew sibe ye, xweş si-  
beye, Kensê ban kir Mehmûdo la-  
wo... topa ewilî teqîya, ji Heçî  
zêde, ji gundê we ye, kaxidek ji  
Begê mi ra hatiye ji Anqerayê, ji  
meclîsê ji bo birina serê we ye.  
Weşarşarê meterkîne, ji berê da  
mulk û meaşê bavê we ye.

Kensê ban kir Mehmûdo lawo,  
ev ferman ji berê da fermana mala  
we ye.

Mehmûd Beg ban kir Evodu-  
rehman, bavê min qapîyê Romê  
aidê te ye. Şerê Etşanê, şer qulipî  
li milê te ye. Ji nîro b' şunda şerê  
her pênc Kurên Brahm Paşa, li  
Weşarşara şewitî, li ber topê Lê  
me' ne ye. Bego dilê, dilê mi di  
bêye.

Etşan bişewite wa bi rê ye,  
ji nîro b' şunda alaya Husên paşa  
tevî dwazde manqa pêda tê ye, tev  
topê û tev bariyê ye, şerki mezin  
çêbû li til—Henê ye, çandir vegirî  
li Etşanê ye, alayî teşkîlî kirin li E-  
nabîyê ye, tabî kolan li Nafelyê ye.

Şahidê Mehmûd Begê zerî exû  
Nûra gelek hene ji tel Henê, heta  
b' Weşarşarê ajot ser topê ye,

Bêlûka Hemdîn Begê hêsrî  
kirin, kir xanê ye. Şixat girtin ar  
berdayê beledîyê ye, pêşîya duxa-  
na ewraqê mehkûma xwe da til—  
Henê û Etşanê ye.

Kensê ban kir: Mehmûdo lawo,  
wexta di gaziya we were Temir  
Beg swarê Hedla, bavê Xunêsê  
ye; bi qêrîne li Edwan û Ehliî ka-  
zanê di ebrê ye.

Xwe bigehînin Rêka Nebî E.  
yûb eleyhiasselam, derbendê di a.

sê ye, pêşî li Nebî Eyûb dawî li  
Kê e û li Mizarê ye, dengê tuma-  
ftka, mîtralyoza tê li ortê ye, dengê  
qumandara tê, li pêşîyê ye,  
dengê topa mezin, cûra dev reş tê,  
li dawyêyê. Qedûr Rahîl—Elya bî  
xwe te vê ye. Eyb tunîne; ew fer-  
mana dewletê ye, mêze Gullî sorê  
mîla pan bûn li çolêye, pêşîyê xwe  
da qesra Husênê Qenco û girê  
Helêliyê ye;

Mêze pêşîya hêsrê me xwe  
da qeza Diyarbekrê ye, û hinka  
xwe da aşê qazan—Gêdûkê ye û da-  
wî ma l' Qerej-daxa şewitî işka xwî  
nê kaniya di mîhe ye.

Kensê ban kir Mehmûdo la-

wo, tîrsa mi ji wê tîrsê ji pêra. li  
hêsrê me xin, eskerê Mûş û Mêr-  
dînyê, deştîyan û mehelyan li gulf  
morê milap bikin ne heqîyê ye.

Mehmûd Beg ban kir Evodu-  
rehman bavê min, heçî hêsrê  
mayî xelaskê bavî bin xetê ye. E-  
yib tu nîne bav û kalê me dafm  
mirin, bi fermana dewletê ye.

Wezîro, mi ji vîra l' eta bi wi-  
ra, sibe bû şerekî çêbû li Etşana  
Xopan li girê Ūzil — açanê li her  
du gira ji nîro b' şunda şerê topê,  
şer qulibî ser milê Mehmûd Begê  
zerî, exû Nûra mezinê bira.

(qedîyaye)

EBDILHADÎ MIHEMED